



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd


## Tîrêjên Çarşembê

### Xelek - 5

## Nameyên Navbera Padîşahên Mîttaniyan û Fer'ewnên Misirê

### Dijberî û dostanî:

Herêmên rojhilatê Derya Sipî (Sûriya, Libnan û Filestîn) di warên aborî û geosiyasî da ji bo *Padîşahiya Misirê* li başûr û *Padîşahiya Mîttanî-Horî* li bakur gelek girîng bûn. Bi taybetî jî - ji ber ku paytextê Mîttaniyan, bajarê Waşûkanî (Washukkani, bi erebî nav lêkirine Til Fexariye) li herêma Cizîra niha, li rojavayê Kurdistanê bû<sup>1</sup>.



(padîşahiya Mîttanî-Horî)

Di dema Fer'ewnê Misirê *Amûnhûtebê Duwem* (ji 1436 heya 1413 b.z. yan jî 1428 heya 1400 b.z. serdarî kiriye) û padîşahê Mîttanî *Sawşattar* (1440 heya 1400 b.z.) da, di rewşa siyasî ya wê herêmê da hevsengî pêkhatibû û du hêzên din beramber van herdu padîşahiyan di asoyê dîrokê da xuyadikirin ku ew jî

*Padîşahiya Aşûr* li rojhilat û *Padîşahiya Hittîtan* li bakur bûn. Ji lew ra, *Padîşahiya Misirê* û *Padîşahiya Mîttanî* li gel hev peymaneka aştiyê danîn û li gor wê Sûriya di navbera wan da hate parvekirin. Di pey ra, di dema Fer'ewn *Tihûtmûsê Çarem* û padîşahê Mîttanî *Artatamayê Yekem* da ev peymaneka aştiyê êdî bû peymaneka dostanî û hevkarîyê û ev dostanî bi peywendiyên zavatiyê di navbera herdu malbatên padîşahî da hate xurtkirin<sup>2</sup>.

Ev peywendiyên dostanî, hevkarî û zavatiyê di dema padîşahê Mîttanî *Şuttarnayê Duwem* (*Shuttarna II*, kurê *Artatama*, ji dor 1380 heya 1366 b.z. serdarî kiriye) û Fer'ewn *Amûnhûtebê Sêhem* (*Amnûfis*) (1390 heyan 1352 b.z.) berdewam bûn. Fer'ewn *Amûnhûteb* bi *Tadû-Xîpa* (*Dadû-Xîpa*) xwişka *Şuttarnayê Duwem* ra zewicî bû û dixwast bi *Tadû-Xîpa* keça *Şuttarnayê Duwem* ra jî bizewice. Ev di sala dehan ya serdariya *Amûnhûtebê Sêhem* da bû; yanê di sala 1380 b.z. da bû. Padîşahê Mîttaniyan ev daxwaza Fer'ewn pêkanî û keça xwe ya bedew *Tadû-Xîpa* li gel cihêzekî giran şande Misirê<sup>3</sup>.



(Fer'ewn Amûnhûtebê Sêhem)

Di Entîkxaneyê (Arşîva) Til Amarne (Tebe) ya Misirê da heft nameyên padîşahê Mîttaniyan *Tûşratta* ji Fer'ewn *Amûnhûtebê Sêhem* ra hene ku kûraniya vê dostaniya nebera wan didin xuyakirin. Va ye em naveroka nameyekê ji wan nameyan didin xuyakirin. Bê guman, wergerandina wan şeş nameyên din û belavkirina wan, wê pir agahdariyan derbarê peywendiyên *Padîşahiya Mîttanî-Horî* û *Padîşahiya Misirê* bidin zanîn.

**Hin beş ji nameyên Tûşratta bo Amûnhûteb:**

*Tûşratta* di nameyeka xwe da ji *Amûnhûtebê Sêhem* ku navê wî pêş bibe Fer'ewn "*Nîmûriya* yan jî *Îmûriya*" bû dibêje: "**Ji bo *Nîmûriya*, padîşahê mezin, padîşahê Misirê, bira û zavayê ku ez pir jê hezdikim û ew jî ji min hez dike. Rewşa min başe. Hêvîdarim ku tu, malabata te, xwîşka min, kebaniyên te yê din, zarokên te, erebe û hespên te, welatê te û her tiştê te, hemû bi xêr û bereketeka pir bin. Dostaniyeka xurt hên ji dema bav û bapîrên me da, me bi hev va girêdide û hên jî hate xurtkirin. Dostaniya te bi bavê min ra gelek xurt bû. Ji ber ku niha jî dostaniyeka gelek xurt di navbera me da heye, te ev dostanî hên deh caran ji dema bavê min xurttir kir. Ev dostaniya me bi vîn û daxwaza Xweda herku diçe xurttir dibe. Bi daxwaza Xweda *Teşşûb* (mezinê xwedawendên Horiyan) û Xweda *Amûn* (mezinê xwedawendên Misiriyên) ev dostaniya me wê herdem bimîne.**

Dema birayê min, şandiyê xwe *Manî*, hinart ba min, got: "**Keça xwe wek kebanî ji min ra bişîne ku bibe padîşaha Misirê**". Ji ber ku ez bi ti awayî naxwazim dilê te bişikînim, min bi kamiranî got: "**Ezê vê daxwaza te bi cih bînim**". Gava *Manî* ev keça ku birayê min dixwaze dît, pir pesna wê da. Ez bi hêvî me ku bi xêr selamt bigihîne welatê birayê min, bi hêviya ku *Aştar* (xwedaya Horiyan *Şawûşka*) û *Amûn* birayê min bidin şahkirin.

Şandiyê min *Cîliya* gotinên birayê min gihandin min. Gava min ew bihîstin, pir li xweşiya min çûn. Bi wan diyariyên ku te şandibûn jî (lodên zêr) ez gelek şahbûm û min got: "**Li ser van peyvan ev dostaniya me wê hemdem be**". Gava min ji birayê xwe ra şand, dîsa min got: "**Deh caran bêhtir ji bavê min ra, min ji birayê xwe pir zêr tika kir û got: "Belkî tu vê carê bêhtirî ku te ji bavê min ra şandibû û her car ji min ra dişand, bişînî. Ma ne te ji bavê min ra pir zêr şandibû, amanên zêr yê mezin, misînên zêrîn û nîgarên zêrîn mezin. Min jî li hember wan pir tiştên ji mis (baqir) şandibûn. Belkî tu vê carê zêrnî pir bêhtirî ku ji bavê min ra hatibû, bişînî**"<sup>4</sup>.

*Tûşrattayê Duwem* di nameyeka din da ji bo *Amûnhûtebê Sêhem* dibêje: "**Ji bo *Amûnhûtebê* rûmetdar, padîşahê Misirê, bira û zavayê ku pir jê hezdikim û ew ji min hezdike, dibêjim, ez *Tûşratta*, padîşahê Mîttanî rûmetdar, birayê te ku ji te hezdike û bavê kebaniya te. Saxiya min başe. Ez silav û giramên xwe ji bira û zavayê xwe ra dişînim û herwisa ji xizimên te, kebaniyên te, zarok û maliyên te ra....**"<sup>5</sup>.

Komek ji nameyên din heye ku padîşah *Tûşratta* ji Fer'ewnekî malbata heşdehmîn ya Misirê ra şandiye. Wek tê xuyakirin ji *Amûnhûtebê Sêhem* ra hatine şandin. Ev hemû name di Til Amarna da hatine dîtin. *Tûşratta* di nameyekê ji wan da dibêje: "**Di dawiyê da bila birayê min rê bide ku ji min agahdar bibe, derbarê derhatinên (mesref) zemawendê (dawetê) ku birayê min bi destê *Manî* şandibûn gihîştin min.... û wisa silav û giramên xwe**

hinartin ji ber ku birayê min diyariyên ku min bi rêya *Manî* xwastibûn gihîştin min. Û ew nameyên ku birayê min ji min ra şandibûn (ku hin diyariyan jî bişîne) ezê pir û pir dilşad bibim. Birayê min! Eve hemû rastiya ku min got"<sup>6</sup>.

Di nameyeka din da bi hejmar 25 tê xuyakirin ku padîşahê Mîttanî *Tûşratta* ji *Amûnêhûtebê Sêhem* diyariya zemawenda keça xwe wergirtiye, ew dibêje: "Ev peykerê ku ji zêr hatiye lêkirin, ev *Tadû-Xîpa* ye, keça *Tûşratta*, padîşahê Mîttanî ku niha bûye kebanîya *Îmûriya*, padîşahê Misirê. *Îmûriya* ji bo wê peykerek ji zêr lêkir û bi temamê hezkirina xwe ra gihand *Tûşratta*"<sup>7</sup>.

Dr. Ebdulêzîz Salih qala nemeyekê ji padîşahê Mîttanî da dike ku nabêje ew kîjane, lê xuyaye ku ji *Tûşratta* ye, ji bo zavayê xwe *Amûnêhûtebê Sêhem* dibêje: "Bira ez hêvîdarim tu zêrnî pir û pir diyarî min bikî. Ez her bawer dikim ku birayê min wê vê daxwaza min bi cih bîne û zêrnî ku bêhtir ji bavê min ra hinartibû ji min ra bişîne. Ma ne zêr li welatê birayê min mîna axa zemînê ye? Bila Xweda xêr û bereketê têxe axa welatê birayê min ku hên ji niha bêhtir pir qat bibe. Ez hêvîdarim ku ev daxwaza min li te giran nayê û te dilteng nake. Ezê ji birayê xwe ra vê comerdiya wî deh qat ji tiştê ku bixaze vegerînim. Ev ax jî axa wî ye û ev mal jî mala wî ye"<sup>8</sup>.

Çarşemb, 29.04.2015

## Jêder

<sup>1</sup> Muhemmed Beyyûmî Mihran, dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 343 - 344.

<sup>2</sup> Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 64. Ehmed Hibo, dîroka rîjhilat ya kevin (Sûriya), rûpel 182.

<sup>3</sup> Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 64. Cemal Reşîd Ehmed, xuyakirina Kurd di dîrokê da, 2/246, 255. Ebdulhemid Zayed, rojhilata hemdem, rûpel 478 - 479.

<sup>4</sup> Tewfîq Sulaiman, lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin, rûpel 314 - 315.

<sup>5</sup> Ehmed Fekhri, lêkolîn li dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 81.

<sup>6</sup> Cemal Reşîd Ehmed, xuyakirina Kurd di dîrokê da, 2/92.

<sup>7</sup> Cemal Reşîd Ehmed, xuyakirina Kurd di dîrokê da, 2/92.

<sup>8</sup> Ebdulêzîz Salih, rojhilata nêzîk ya kevin (Misir û Sûriya), rûpel 238.